Rojava ji Îrana xwedî bombeya etomî ditirse
»»» R:7

Komara Kurdistanê çi peyamek bo me li pey xwe bi cî hêlaye?
»»» R:4

Komara Kurdistanê, têkşikandina faşizma Îranî
»»» R:5

Kurd û pêdiviyên yekrêziyê û xwendineke nû
»»» R:8

Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de

Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (390) 21-01-2021 Buha (1000) Tûmen

Meznahiya Herman a Gel

2ê Rêbendana sala 1324an a Rojî, bûyereke girîng a dîrokî qewimî ku ne bi tenê di wê qonaxa hestiyar de belkî li ser paşeroja gel û welat de jî karî bandorê danê; Handanek bû ku her wekî karnas dibêjin, rêxweşkerê serhildanê bû, rabûn di hember dujmin û xwenaskirina neteweyeke zilimdîtî bû ku wê demê tenê hewla wê zindîman bû.

Di wê demê de hejmarek ji rewşenbîr û kesên têgihîştî yên Kurd li Rojhilatê Kurditsanê ku di çarçoveya partiyeke modern dora hev kom bibûn, biryar dan ku stûnên desthilatekê ava bikin ku Kurd wekî her mirovekî li ser erdê bi azadî bijîn û bi xwe biryarê li ser qedera xwe bidin û hevsarê jiyan û derbaskirinê bi destê xwe ve bigrin û êdî xelkên din ji cihên dinê ve neyên heta rê û rewşên jiyanê nîşanê wan bidin.

Di wê bûyerê de ku heta niha jî nivşên piştî wan rewşenbîran, piştî 75 salan bi şanaziyê ve basa wan dikin û gotinan li ser dikin ku ev jî pêk tê ji avakirina Komara netewî-demokratîk a Kurdistanê ji aliyê Partiya Demokrat a Kurdistanê û kesayetiyeke mezin wekî "Pêşewa" Qazî Mihemed. Komara Kurdistanê hate avakirin û hewl bona dabînkirin û cihgîrkirina demokrasiyê hate dan, ji ber ku rêberên Komarê bi başî têgihîştibûn ku demokrasî û dewleta xelkê li ser xelkê take rêya gihîştin bi serweriyê ye; hewl bo xelkê Kurd hate dan ku ew bi hişyarî û zaniyariyeke tewaw, mafê mirovî û cîhaniyên xwe nas bikin û bo paşeroja xwe, di biryardanan de serbixwe bin.

Komra Kurdistanê hate avakirin ku di welat de gul û ciwanî şîn be, û îdalet û wekhevî geşeyê bike, û ti mirovek ji aliyê ti kesekî din ve neyê piştguhxistin û kerameta wan neyê şikandin.

Rohn û berçav bû ku ew daxwaz û hêviya bilind ji aliyê dagîrker û neyaran ve cihê qebûlkirina wan nîne, her wekî niha jî ku qebûl nakin, lewma biryara jinavbirina wê dan û piştî 11 mehan, Komar bû qurbaniyê hindek ji danûstandinên siyasî, û wan dujmin û neyaran Komar rastî şikest û herifînê kirin, lê ya ku wan kir bi tenê jinavbirina cesteya birîndar a Komarê bû û nedizanîn ku wesiyeta "Pêşewayê Kurdan" di dema îdamkirinê de ku got: "Hûn serê Pêşewayekî dibirin, lê nizanin piştî wî, hezaran Pêşewa dê ji dayîk bibin, ka hûn dê çi ji wan bikin?", bi tenê silogan nebû, û gelek pê naçe ku tolhilderê gel, xortên bikêrhatî yên Komarê, doz û rêbaza Komarê peyda dikin û hewlê bona rizgariya gelê xwe didin.
Lewma me dît her wekî dîrok şahidiyê bo dide, piştî jinavçûna Komarê têkoşerên Demokrat li salên 46-47-an, deryaya mend a Rizaşah aloz kirin, û piştî şoreşa gelan di Îranê de jî xortekî wekî "Dr. Qasimlo"yê hertim zindî çarçove û pêkhateya Partiya Qazî, û xwest û daxazên Komarê tê de darêşt, û "Şerefkendî"yê zana bi zanayî ve ew parast û ew emanet radestî nivşa piştî xwe kir û îro jî, "Rasaniyên Bajar û Çiya" li çiyayan de alaya Komarê bilind dikin û hewlê bona bidestveanîna daxwazên wê didin.

Îro 75 sal ser wê bûyerê re derbas dibe, lê binyatên hizrî yên Komarê û hêvî û armancên wê neku ji nav neçûn, belkû qahîm mane û geşe kirine, û zêdetir ji caran di hizir û bîrên xelkê de li jiyana wan de têne dîtin.

Bilind û pîroz be yad û bîra yekem kiyana modern, demokratîk û netewî ya Kurd, û îlhamderê xebat û şoreş bo gelê Kurd û Kurdistanê.

Sergotar

N: Kerîm Perwîzî

Serhildana “Çilka Derûn”

Sîstemeke Koloniyalîstî wekî Komara Îslamî ku li ser binyata reşkirin û înkarkirina hemû rengên cuda hatiye avakirin, û bi êrîşên Spaha Pasdaran li ser cih û beşên cuda yên Îranê deshilata xwe sepandiye; ji hemû alavên req û nerim, bona cihgîrkirin û mana xwe mifahên xirab wergirtiye.

Kuştin, îşkence û îdam û ramalîna xelkê, taktîka herî berçav a Komara Îslamî û hêzên serkutker bûye, û bi berdewamî û di heyamê 4 dehikên derbasbûyî de, li dijî xelkê bi kar aniye. Ji wan girîngtir, hewla berdewamî ya wê rejîma Koloniyalîstî hey, tevî ku kiryarên wê Koloniyalîstî û faşîstî bûne, lê rûyeke din li xwe nîşan bide.

Bi wê wateyê ku Komara Îslamî yek ji wan rejîmane ye ku hewleke hovane bikiryar li ser şeqam û ber deriyê malên xelkê dikir û dike, lê ji aliyê deng û reng ve hewla perdepoşkirina wê daye. Komara Îslamî xwestiye ku di rû de tiştekî din nîşanê civatgeha cîhanê bide, û rûmeta hikûmeta dad û dadperweriyê û alîgirê hejaran nîşan bide, ku wekî maskekê li ser rûyê xwe danîbin û bi wê wêneya saxte li hember hizra gîştî xwe bide nîşandan; lê di praktîk de a ku xwasta hundirê wê bûye bi dûr ji lênza kamêrayê encam daye.
Yek ji hezaran mînakên wiha ji kiryar û çalakiyên rejîmê, dosyeya navikiya wê ye, zêdetir ji 2 dehikan e ku civaka navnetewî bi rejîmê re dibêje, hewlên te bona bidestveanîna çeka navikî ye û rejîmê jî digel Ajansa Navnetewî civînê dike û dibêje, “wiha nîne”! Lê, her carê derevek din a wê bo civatgeha cîhanê eşkere dibe ku di parktîk de, pêngav bona berhemanîna çeka navikî hilgirtiye.

Ew taybetmendiyên Komara Îslamî bûne sedem ku xelkê Îranê û netewên li nav wê cografiyaya belalêketî bi berdewamî rastî êş û jan û zehmetiyan bên, û rejîm jî wekî hertimî înkara êş û jan û zehmetiyan ji aliyê wan ve dike, û tenê di mînakekê de rûyê wê yê rastî derket ku ev jî xistina xwarê ya balafira rêwîtiyê ya Ukraynê ji aliyê Spaha Pasdaran ve bû, û ev jî bo hemû cîhanê rohn bû û derket ku rejîma Îranê heta çi astekê çewtekar e.
Di wan rojên derbasbûyî de, li televîzyona Komara Îslamî, sivikatiyeke rohn û bêşermane bi nasnameya Kurd hate kirin û ew kiryara rejîmê rastî bertekên berfireh yên hemû tex û qatên Kurdan hat.

Komara Îslamî bi awayê sîstematîk, hewla jinavbirina netewa Kurd û netewên din dide û herwisa bi awayên curbicur bêrêziyê bi wan dike heta ku bi şikandin û sivikatîkirinan bikare hêsantir dest li ser wan danê û wan bike toz, eva rastiyeke rohn û eşkere ye ku, herçiqas rejîmê bi berdewamî ew înkar kiriye û dike, heta ku xwe ji reaksiyonên siyaseta xwe veqelizîne, lê bi nişkê ve tiştek jê derdikeve, û hemû bendikên vehûnandî yên wê dibin hirî.

Ew sîstema koloniyalîstî bi sivikatîkirin û kuştinan dixwaze netewên din ji nav bibe û di hundirê civaka navendnişîn de kerb û kîn li dijî netewên piştguhxistî perwede bike û tê dîtin ku di bûyereke wiha de pirzikeke nehez li ser rû û maska xemilandî de derdikeve, û ew bi tenê pirzik û xaleke asayî nîne, belkî tijîbûna wê sîstemê ji çilk û gemara gendeliya hundirî nîşan dide.

PDKÎ: Komar nema, lê yad û bîra wê hertim zîndî ye û yadigarên wê bûne bi sembol

Navenda Siyasî ya Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê bi hilkefta 2`ê Rêbendanê, salvegera avakirina Komara Kurdistanê daxuyaniyek belav kir.

Deqa daxuyaniyê wiha ye:
Daxuyaniya Navenda Siyasî ya PDKÎ
Bi hilkefta 2`ê Rêbendanê, 75`emîn salvegera avakirina Komara Kurdistanê
Hevwelatiyên rêzdar
Civatgeha mafxwaz a xelkê Kurdistanê
Parêzerên maf û azadiya gelê Kurd
2`ê Rêbendana îsal, 75`emîn salvegera avakirina Komara Kurdistanê ye. Ev Komare ku li 2`ê Rêbendana sala 1324`an a Rojî, ji aliyê Partiya Demokrat a Kurdistan û bi destê Pêşewayê nemir Qazî Mihemed li beşek axa Rojhilatê Kurditanê di navenda bajarê Mihabadê de hate avakirin.
Em bi vê hilkefta dîrokî pîrozbahî li hemû xortên gelê Kurd bi taybet xortên gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê dikin û hêvîxwaz in bi dirêjahiya xebat û têkoşanê destkevtên Komara Kurdistanê bi dest ve bê anîn.
Avakirina Komara Kurdistanê bi wan teybetmendiyên Demokratîk ve, guherîneke nû li dîroka xebata gelê Kurd de tomar kir. Bo cara yekem Kurd di vê beşê li Rojhilatê Kurdistanê bo bi xwediyê kiyan û desthilateke Kurdî di şiklê Komarekê de û ev jî di devereke aloz û pirdîktatora wê demê ya Rojhilata navîn de ku her bi xwe diyardeyeke hêvîbexş bo netewên jêr dest di Îran û deverê de bû.
Girîngî û bandora berçav a avakirina Komara Kurdistanê ji wê dîdgehê ve cihê nirx û balkêşandinê ye ku bi avakirina wê Komarê, bo cara yekê gelê Kurd di wê beşa Kurdistanê de bû bi xwediyê kiyaneke demokratîka netewî û hebûna wê kiyana Kurdî û nirxên netewî û azadiyê tam kir; Zulma dujmin û binpêkirina mafên wan ji aliyê desthilata navendî ve hate rakirin û seha xwebûn û taybetiyên gelê Kurd kir.
Rexsana derfetek wiha vedigere li ser wê rastiyê ku berî avakirina Komara Kurdistanê, Partiyeke Demokrat û pêşketî ya Kurd bi rêbaratiya bi kom di bin navê Partiya Demokrat a Kurdistanê de hatibû avakirin.
Naveroka Demokratîk ya wê Partiyê di naveroka Demokratîk a Komara Kurdistanê de jî rengê wê xuya bû û ew Komare kir bi deshilateke demokratîk a bê mînak di deverê de.
Cuda ji geşa hizir û seha netewî berî avakirina Komara Kurdistanê ku hebû û ji aliyê Komeleya “J.K”ê ve ku piştre Partiya Demokrat li ser bingeha wê hatibû avakirin, zêdetir û berfirehtir geşe pêphatibû ku di qewaregirtina wê desthilata Kurdî de bandordar bû.
Lewma em dikarin bibêjin, hekî binyata geşeya seha netewî û avakirina Partiya Demokrat di gorê de nebaya, gelek zehmet bû ku Komara Kurdistanê bihata avakirin û hekî bihata avakirinê jî, xwediyê wan taybetmendiyên demokratîk yên heyî nedibû.
Destkevtên Komara Kurdistanê di gelek waran de girîng û pir bi nirx in ku her yek ji wan bi tenê baseke dirêj û lêkolîneke hûr dixwaze ku hatine kirin, lê girîn e ku bi bîr bînin ku li Komara Kurdistanê, azadiya gotin bi wateya xwe ya rast bo tev kesan heta bo dujminên Komarê û şexsê Pêşewa jî hatibû misogerkirin, bi awayekî ku ti kesek li ser hizra cuda û heta dijî Komarê, nedikete bin lêpirsînan û gotinên wan nedihatine sînordarkirin.
Renge bo cîhana îro jî bi zehmet cihê bawerê be ku di Komara Kurdistanê de, girtîgeh û girtî tinebûn, azadiya ol û mezheban bi tewawî hebû û ewlehiya canî û malî bo hemû kesan hatibû dabînkirin.
Lewma bibû cihê hêviya Kurd li her aliyên din yên Kurdistanê û bi xweziyan ve çav lê dikirin û heta têde beşdar bûn û rûmeta netewiya wê pir rengtir bû.
Komara Kurdistanê bi wan taybetmendiyên netewî û demokratîk ve, giraniyek xistibû li ser dilê desthilatên dîktator yên deverê û li dijî wê rawestan û ji wê zêdetir, berjewendiyên serkevtiyên şerê cîhanî yê 2ê jî rêya man û geşeya Komarê teng kiribû, lewma piştî 11 mehan çiriskîna wê di esmanê jiyana Kurd de, şemala temenê wê hate temirandin.
Komar nema lê, bîra wê tim zindî ye û yadigarên wê wekî alaya Kurdistan, sirûda netewî ya “Ey Reqîb” û pêşmerge û zimanê Kurdî, nek tenê bo Kurdên Rojhilatê Kurdistanê, belkî bo Kurdên aliyên din yên Kurdistanê jî bûn bi sembol û bi rêz ve çav lê dikin û rewatiya netewî pê dibexşin.
Piştî nama Komarê û şehîdkirina Pêşewa û hevalên wî û binçavkirina rêberên Hizbê û karbidestên Komarê, tevî vê yekê ku janeke dijwar bû, seha netewî ya xortên Kurdan kêm nebû, xebat û qurbanîdan bona bidestveanîna destkevtên Komarê tevî ku bi dawî nahatin, belkî bihêztir û bigerm û gurtir man.
Li heyamê 74 salên derbasbûyî yê xebat û xweragiriya gelê Kurd bi taybet Partiya Qazî, Qasimlo, Şerefkendî û hezaran şehîdên din berdewam bûye. Xebata niha ku bi awayên cuda li dijî rejîma Îslamî ya Îranê wekî rejîmek ku xwediyê îdolojiyeke kevneperestane û paremayî, wekî rejîmeke serkêş ku li dijî demokrasî, mafê mirov, mafên netewî yên di bin zulma rejîma Îranê de, wekî rejîmeke terorîst û terorîstperwer, rejîmeke biyanî digel ruhê serdem, di halê xebat û xweragiriyê de ye.
Wê rejîmê bi tedaxul li karûbarê hundir yê welatên deverê, geşe bi çanda kevneperestî û xurafatê rengek xirab xistiye ber çavên cîhanê, hemû darayiya welat û berjwendiyên Îranê li pêxema geşedan bi îdolojiya xwe û dabînkirina hewcehî û alavên teror û afirandina fitne bo girûpên terorîstî yên destperewerdeyên xwe bi heder dide û xelkê Îranê rastî hejarî, renbenî, bêkarî û bêderetaniyê kiriye û nerizayetiya xelkê di asta herî bilind de ye, lewma wê rejîma nehs nêzî hilûşînê ve dibe û ew jî rêya xebatê hêsantir dike.
Xebata me li dijî rejîmeke wiha har û bê hewsar, xebeteke mirovî, netewî û azadîxwazane ye, xebateke rewa û heq e, û her lewma cihê piştevaniya xortên gelê Kurd û azadîxwazên rasteqîne ye.
Li 75mîn salvegera vebîranîna Komara Kurdistanê, em soza xwe nû dikin ku heta serkevtin û bidestveanîna destkevtên Komara Kurdistanê, li xebat û xweragiriyê berdewam û micidtir bin.
Li 74`emîn sala şehîdkirina Pêşewayê Kurd, Qazî Mihemed û cangorîkirina rêberên Partî û karbidestên Komarê, wesiyet û pêsipartiya Pêşewa ya pêwendîdar bi nebûna yekgirtinê, bervajî digel yekparçeyî û yekgirtinê dikin bi çiraya ronahîker a rêbaza xebata xwe û bi geşedan bi wê xebatê di meydanan û panatiya bajar û çiya, mewdaya gihîştin bi maf û azadiyên xwe kêmtir û kurttir dikin.

Yad û bîra Komarê bilind û bi şan be

Canê paqij ê Pêşewa û rêberên Hizib û Komarê bi gihîştin bi armancên wan şad û aram be

Silav li Partiya avakerê Komara Kurdistanê, Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê
Silav li canê paqij ê hemû şehîdên Kurdistanê
Silav li girtiyên siyasî
Silav li jankêşandiyan û kêmendamên meydana xebat û xweragiriyê
Silav li rêbaza rewa û bi heq a xebata Kurd
Silav li hemû xelkê xweragir yê Kurdistanê û piştevanê hertimî yê xebata Kurd û Partiya avaker a Komara Kurdistanê
Serkevtin bo xebata Kurd û têkoşerên Demokrat
Partiya Demokrat a Kurdistana Îranê
Navenda Siyasî
19`ê Kanûna Paşîn a 2021`an
30`ê Befranbara sala 1399`an a Rojî

Komara Kurdistanê çi peyamek bo me li pey xwe bi cî hêlaye?

N: Nûredîn Sofîzade

Îsal 75 sal bi ser avakirina Komara Kurdistanê re derbas dibe ku ji aliyê Hizba Demokrat a Kurdistanê û bi pêşengî û serokatiya rêberê wê Hizbê Pêşewa Qazî Mihemed ve di ser parek ji axa Rojhilatê Kurdistanê hate ragihandin, ku navenda wê anku paytexta Komara Kurdistanê jî bajarê Mehabadê bû.

Di dîroka xebata rizgarîxwaziya netewa Kurd de eva yekem dewleta serdemiyane û modern a Kurdan bû hate avakirin ku hemî pîvanên dewletdariyê bi xwe ve girtibûn.

Hekî çi rûberê cografiyayî ya wê Komarê gorî rûberê axa Kurdistanê gelek biçûk bû û tenê di ya ji 4ê ya axa Rojhilatê Kurdistanê bi xwe ve digirt, lê di warê hest û tehsîb û xwedîjêderketinê ve hemî cografiyaya Kurdistana mezin bi xwe ve girtibû û ji her sê perçên dinê a Kurdistanê, gelê me ev destkevt bi ya xwe dizanîn û erkê xwe dizanîn ku jê xwedî derkevin, her Kurdekî rizgarîxwaz û xwedî îrade ji perçên dinê ve hem bo beşdarî di cejna ragihandina Komarê de û hem bo parastin û xizmetkirina wê berê xwe dane Mihabadê.

Bo mînak hêza Pêşmergên teyar û xwedî ceribandin a Barizaniyan bi serokatiya nemir Mela Mistefa Barizanî, sedan şoreşvan û xwedî şopa Şêx Ubeydullah Nehrî, ji deverên Şemzînan û hekariyê bi serokatiya Seyîd Teha, dehan xebatkar û rewşenbîr ji Rojavayê Kurdistanê, dehan rewşenbîr, helbestvan, nivîskar, efserên Kurd yên di nava Artêşa Îraqê de, ji Başûrê kurdistan, pêla hezaran kesiye xortên welatparêz ji wan navçên Rojhilatê ku deshilata Komarê negîhabû wan deran weke Îlam, Kirmaşan û Sinê, hemiyan bera xwe dane Komarê û bona xizmetkirin bi Komarê û hivîdarbûn bo ewê ku di pêşerojê de belkî bikarin rûberê Komarê berfireh bikin, kevtine kar û xizmetiyan.

Di vê derheqê de ger em ji vê hestê û xwedîderkevtin ji wê destkevta Kurdan di parek ji axa kurdistanê bifikrin, ew dikare bo me yên îro û nivşa nû ya xebatkarên Kurd re bibe peyam û dersekî mezin.

Ew peyama çiye û çi dibêje me û riha wan kesên ku di avakirin û xizmetkirina Komara Kurdistanê de bandor hebûne çi ji me dixwaze, ger em şopênerê rê û rêbaza rastîn a Komarê bin?

Berî her tiştekê ew peyama yekîtiyê dide me, me bas kir ku çawan ji her çar perçên Kuristanê, welatparêzên Kurd bona parastin û xizmetkirin bi komarê xwe erkdar zanîne, erê gelo îro meyê Kurd zêdebarî ewê ku mixabin her perçekirî mane, heman tehsîb û hest heye ku di kîjan perçê de destkevteke Kurdan hebe, amade bin bi dil û can xwe parêzvanê wê destkevtê bizanin?

Bê goman ger rastî tehl be jî, em bi cesaret ve dikarin bêjin bersiv nigatîv e, nexêr ne! hest û tehsîba me Kurdan gelek lewaz e, bo mînak ger em amajê bi destkevta Kurdan li Başûrê Kurdistanê bikin ku bi hemî kêmasiyên xwe ve dewleta Kurdane û dikarim îdia bikim Komarekî dinê a kurdistanê ye, me heta niha xwe erkdarê parastina wê zaniye?

Bê goman ne, tenê ew heste gelek kêm bûye, mixabin gelek caran ava hin kes û aliyan bi ava dijminan re di cokekê de diçe û cehda têkdana û nehêlana wê destkevtê jî didin.

Lê eva cihê serbilindiyê û cihê şanaziya şopînerê rastîn yên armancên Komarê eva ye ku aliyê kêm Rojhilata Kurdistanê û bi taybetî Partî a damezrênerê Komarê anku Hizba Demûkrat gorî şiyana xwe, xwe pêbend û sozdarê wê peyama Komarê zaniye û bi kiryar jî bo parastina destkevta Kurdan li Başûr gelek nirx daye ku ez naxwazim di wê nivîsênê de basê wan bedelan bikim.

Peyamekî dinê ku Komara Kurdistan piştî xwe bo me bi cî hêla ye ev e ku, bi bê berçavgirtina ku kanê kê xelkê kîderê û ji kîjan perça Kurdistanê ye û ser bi kîjan aliyê ye, beşdar dike di nava birêveberiya erkê destkevt û dewlata Kurdî de, daku ew yeka bibe sedemê çêkirina yekîtiya netewî û her aliyek xwe erkdar û xwediyê destkevtê bizane û amade be bi her nirxekê biparêze.

Em dizanin ku Komarê ew kare dikir daku bingeha dewletek qahîm dabinê ku ya hemî netewa Kurd be, ne destkevt û dewleta perçekê yan navçekê, yan Hizb û saziyek siyasî.

Her lewma em dibînin ku di demekê de ku Komara Kurdistanê ji aliyê hizba Demokrat û rêber wê hizba Qazî Mihemed ve tête avakirin, lê qet Hizba Demukrat xwe xwediyê wê destkevtê nezaniye, belkî wisa dizane ku şanaziyek mezîn bi dest xistiye ku kariye destkevtekê bo gelê xwe bi diyarî bîne û bike milkê hemî Kurdan, yan Hizaba Demokrat di heyamê temenê pirserweriyê ya Komara Kurdistanê de, qet cehada qorixkirina hemî deshilatê bo xwe nedaye. Belkî bi berevajî aliyên cor bi core erk û birêvebirina dewlata Komara Kurdistanê, spartiye kesên lêzan û xwedî bandor, bi bê berçavgirtina ewê ku ew kese kê ye û xelkê kîjan perçe û navça kurdistanê ye.

Bê goman peyam û ders û şîretên ku ji Komara Kurdistanê bo me mane gelek in. Ez hivîdar im ku em xwe erkdar bizanin ku wekî şopînerekî emegdar ê rêbaz û armancên Komarê bo gihîştina bi hemen nirx û destkevtên hevşêwe yên Komarê pêngavan bihavêjin.
Bi hilkefta 75`emîn salvegera damezrandina Komara Kurdistanê, ez pîrozbahiyê dibêjme hemî gelê Kurd, malbatên serbilind ên şehîdan û hemî xebatkar û domderên rêbaza Komara Kurdistanê û Pêşawa Qazî Mihemed.
Bi hêviya bidestvehatina ji nû ve armancên Komara Kurdistanê.

Komara Kurdistanê, têkşikandina faşizma Îranî



N: Elî Munezemî

Nirx û sembolên kurdan hertim ji aliyên dagîrkeran ve rastî êrîş, bêhurmetî û şikandinê tên. Jiber ku faşîzm merivan fanatîk perwerde dike û ew yeka jî nirxên merivanetiyê cem wan dikuje û her tiştek ku ya wan bi xwe nebe, ji aliyê wan ve dikeve ber êrîşê. Armanca wan ewa ye ku nehêlin çi nirx û sembolek li derveyî bazneya îdolojiya wan bimîne û eger ji destê wan jî neyê ku wan bi yekcarî li holê rakin, wan nirxan wisa gemarî bikin ku li ber çavê xelkê bê xistin.

Faşîstên Îranî derheq vê yekê serî li hemû faşîstên cîhanê standine. Her li ber hevpariya îdolojîk di navbera Îraniyan û kesên wek "Hîtler" û "Mûsûlînî" de bû ku di çaxê şerê cîhanî yê duhemîn de, "Riza Xanê Pehlewî" piştgirî da bereya faşîzm-nazîsmê û vê yekê jî rê xweşkir ku DYA, Brîtaniya ji aliyê başûr û Soviyet jî ji aliyê bakur ve bêne nav xaliya welatê fermî yê Îrana wî demî.

Kurdan jî ku her li pêş 1514`ê ya Zayînî de heya wî demî û heta îro rojê jî hertim li benda derfetê bûn ku bikarin axa xwe rizgar bikin û bi xwe bibin xwediyê desthilatê li ser axa xwe.

Piştî şikesta çend caran ya şoreşên Kurdan li dema paşatiya "Riza Xan" de, lê wan qet hêviya xwe winda nekiribûn û bi nepenî her li cehd û têkoşînê de bûn bo ku hemû astengiyên li ser rêya xwe hilbigrin û wê armanca xwe realize bikin. Wan baş dizanî ku jiyan tevî faşîstan nikare çi xêrek bo wan hebe. Lewma gava ku derfet kete destê wan, li mod û forma çalakiyên veşartî (nepenî) ku li organîzasiyona bi navê "Komeleya Jiyanewe ya Kurdistan"ê de pêşve dibirin, guhertin û li forma partiyek siyasî a nûjen, welathez, demokrat û netewî de hatin meydanê. Ewan navê partiya xwe ya nû danîn: "Partiya Demokrat a Kurdistan"ê û Pêşewa Qazî Mihemed jî wek rêberê Partiyê hilbijartin. Ew Partiya zû ji aliyê Kurdan li hemû perçeyên Kurdistanê hate piştgirîkirin. Ewan karî li demek kin de, li herêmek bi rûberek piçûk de, desthilatdariyek netewî-nîştimanî ava bikin û hemû nîşanê dagîrkeriya Îranê li holê rakin. Desthilatdariya kurdan li sîstemek Komarî de xwe organize kir. Şêweya wê desthilatdariyê, heta îro rojê jî li Rojhilata Navîn de dûbare nebûye. Bo selimandina wê gotinê, em dikarin bas li çend argûment û belgeyên objektîv û bêaliyane bikin:

-Komar ne tenê ji aliyê xelkê bin desthilatdariya xwe de, belkî ji aliyê pirraniya Kurdên Kurdistana mezin ve dihate piştgirîkirin û heta îro rojê jî pirraniya Kurdan li ser dîroka wê Komarê yekdeng in û bi dîroka giştî a Kurdan dihesibînin. Yanî ew hikûmet ji aliyê xelkê xwe ve rewabûna wê hatibû pejirandin û desthilatdar, xwediyê otorîteyekê bûn ku xelkê bi wan spartibû.

-Kurdên hemû perçeyên Kurdistanê di bin sîbera wê desthilatê de, xwediyê maf, azadî û erkên wek hev bûn.

-Wê desthilatê ne tenê mafê Kurdan, lê mafê kêm-netewe û xelkê neKurd jî her wek Kurdan diparast.

-Ew hikûmeta xizmetkarê gelê xwe bû û li ew îmkanat û tiştên ber destê xwe de, bo xizmet bi çand, xweşbijêvî, saxlemî û parastina gelê xwe mifah werdigirt û xwe xizmetkarê gelê xwe dizanî.

-Komara Kurdistanê cehd dikir ku neteweheziyê li ser bingeha nîştimanperweriyê pêş bêxe û ew hizra demokratîk jî berevajî hizra dagîrkeran û faşîstan e.

-Komara kurdistanê karî rola jin û lawan di pêşveçûna welat de bilind bike û bi çêkirina rêkxistinên taybet bi wan, wan jî bikşîne meydana çalakiyên siyasî ku bikarin li xemilandina çarenivîsa xwe û welat de rola xwe bilîzin.

-Komara Kudistanê bê bikaranîna hêza fîzîkî û givaş û zextkirin li xelkê xwe, li alavên bêtundûtîjî bo netewesaziyê mifah wergirt û bo hikûmetsaziyê jî, hember dagîrkeran de nebe, hêza çekdar bikar neanî.
-Li hemûyan girîngtir wefadarî û xwedîderketina rêberên Komarê û bixasma Serkomar Pêşwa Qazî Mihemed, li soza xwe û ew ehd û peymana tevî xelkê xwe girêdayî û bi cî nehêlana xelkê xwe li dema tengaviyê de bo hindê dibe ku li dîroka merivahiyê de were qeydkirin û wek dersa exlaq bo hemû rêberan re bê gotin.

Meriv dikare zaf xalên erênî yên din jî li ser Komara Kurdistanê û rêberê wê bêje. Her ew karakter û nirxên wiha bûne sedem ku dagîrkerên Kurdistanê bi proje û bi rêka mohre û bikirêgirtiyên xwe ve hemû bo şkandina kesayetiya takên Kurd, rêber û sembolên me hertim pilangêriya bikin. Her ew giranî, rastbûn û mafdarbûna rêberên Komarê bû ku hêz û potansiyela xwe wisa di nava hizr û dilê Kurdan de hêla ku heta îro rojê jî gelê kurd wefadar maye bi armancê Komara Kurdistanê û têdikoşin wê carê Komarekê ava bikin ku hemû rûberê Kurdistana mezin ji xwe bigre. Yê ew roj jî were.

900 Meh Serbilindiya Neteweyî

N: Serbest Urmiye

Roja 2`ê Rêbendana îsal 75 sal wate 900 meh bi ser avabûna Komara Kurdistanê de derbas dibin. Meha Rêbendanê di dîroka hevçerx a gelê Kurd de, xwedî taybetmendiyeke berçav e û ji damezirandina yekemîn Komara dîrokî ya Kurdistanê li vê mehê û di sala 1324`an a Rojî de, weke stêrkeke geş di dîroka tevgera siyasî – neteweyî de tê mêzekirin. Avabûna Komareke neteweyî û pêşkevtinxwaz ku renge temenê wê zêde dirêj nebû, lê çi guman têde nînin ku di heyamê xwe û di Rojhilata Navîn de, yekemîn hikûmeta demokratîk bû ku li ser bingeha daxwazî û hişiyariya neteweyî ava bibû. Heke meriv baş jê mêze bike, li serdemê avabûna Komara Kurdistanê heya çend salên pêş û piştre jî di dîroka hevçax a welatên derdor de, çi dewletek li ser bingeha îradeya gel ava nebûye. Ya xuya ye eva ye, pişkek ji wan dewletan di encama derbeyeke leşkirî de û pişka din jî ji aliyê hêzên dagîrker en bîhanî ve hatine destnîşan kirin û bi destê zoriyê bi ser welatiyan de hatine sepandin.

Weke mînak hikûmeta Îraqê ji aliyê dagîrkerên Berîtaniyayî ve hat destnîşankirin û heta serokê vê jî bo cara yekem ji welateke derdor anîn û bi ser de sepandin. Her çend ku piştre jî bi derbeyeke leşkirî hate hilweşandin, lê di encam de jî dîsan taqimeke kodetaçî dest bi ser birêveberiya welat de girtin û ev terz ji hikûmetdariye bo cara çendan di vî welatî de dubare bû. Yan heke em bala xwe bidinê, hikûmeta Pehlewî ku wê demê di Îranê de hikim dikir, di destpêkê de di encama derbeyeke leşkirî ji aliyê Riza Xanê Mîrpenc ve hate damezirandin û bo cara duhemîn jî di encama derbeya leşkirî ya 28`ê Gelawêj a sala 1332`an ya Rojî de û bi piştîvaniya dagîrkerên bîhanî dubare hakimiyeta welat xiste bin destê xwe.

Komara Kurdistanê di wî çaxî de, serbarê vê çendê ku encama îradeya neteweyî ya gelê Kurd bû, bo cara yekemîn jî di dîrokê de gelê Kurd kire xwediyê saman û herêmeke siyasî û neteweyî. Di rastî de gelê Kurd di 2`ê Rêbendanê de û bi damezirandina Komara Kurdistanê, da xuyakirin ku serbarê zilm û zoriya dagîrker ku bi salan e li ser Kurdan heye, lê gelê Kurd û Kurdistan hêj li ser pêyê xwe ne û li hember dijmin de serî natewandine. Ji aliyeke din ve Komara Kurdistanê berevajî piropagendeyên dijmin û dagîrkerên Kurdistanê, da selimandin ku gelê Kurd di îdare û birêveberiya welat û samanên neteweyî yên xwe de kêmtir ji çi gelên herêm û cîhanê nîne û ne hewceyî sergêriya kes û aliyekê xêncî xwe ye.

Komara Kurdistanê Di Navbera Pilanên Neyaran Û Serhildana Neteweyî De

Ji bo kêmkirina bandor û mezinatiya Komarê di hizra giştî ya nifşa piştî Komarê de, dagîrker û neyarên Kurd bê pîlan nebûne û hertim hewil dane çi di rêya dar û destekên nejadperest ên xwe û çi di rêya bi kirêgirtina taqimên xwefiroş ên Kurd û bîhanî de, Komara Kurdistanê weke destkevteke neteweyî û berhema hişiyarî û serhildana gel ji ber çavan reş bikin û bikin encama hatin û xweşkirina zirûf û destnîşankiriya hêzên bîhanî ve û ji bo vê mijarê jî hatina leşkrê Ûris ji aliyê bakur û leşkirên Berîtanî û Emerîkî ji aliyê başûrê Îranê ve dikin faktera piropagendeyên xwe. Helbet pitir li ser vê yeke ne ku Komara Kurdistanê û Serok û karbidestên wê bibin bin sîbera yekîtiya sovîyetê a wê demê. Lê ya ku li gor hemû fakterên hundir ên

Kurdistanê didin xuyakirin eva ye ku Komar berhema serhildan û hişiyariya neteweyî ye û xwedîderketina gel ji vê destkevta xwe ya dîrokî hemû piropagendeyên neyaran pûç kirine.

Heke em pênaseyeke kurt ji serhildan û sedemên çêbûna serhildanan bikin, eşkere ye ku Komara Kurdistanê berhema serhildan û hişiyariya gelê Kurd e û ne tiştek din.

Serhildan: Bi giştî serhildan derencama bûyerên cor ci cor di dîroka welatekê de hatiye zanîn û pêvajoyek e ji bo ji holêrakirin yan guhertinê di biyavên civakî, exlaqî, aborî û nemaze siyasî de ye û fakterên weke 1. Nerazîbûn ji rewşa zal 2. Hebûna bîr û rayên cuda 3. Geşekirin û berfirehbûna hesta şoreşgerî 4. Rol û pêgeha hêz û aliyên siyasî û civakî di serxistina serhildanê de bi bandor in.

Heke em ji civaka Kurdistanê û jîngeha serhildana Komara Kurdistanê mêze bikin, hemû fakterên han tên xuya kirin. Siyaseta parehêlan û astengkirina geşekirina civakî, aborî, çandî û xwendin û zanînê ji aliyê dagîrker ve ku vê demê ji aliyê rejîma Pehlewî ve bi ser Kurdistane de dimeşiya, û bibû sedem ku hişiyariya neteweyî û hesta şoreşê di Kurdistanê de xurt bibe ku di encam de peydabûna pariyên siyasî weke Komeley Jiyanewey Kurdistan û piştre Partiya Demokrat a Kurdistanê ava bibin û xortên şoreşger ên gel, li dijî hemû pêkhateya rejîma Pehlewî hevbigirin. Encama vê hişiyariyê û hevgirtinê jî avabûna Komara Kurdistanê bû. Her wê hişiyariya neteweyî jî wisa kir ku di demeke nezîk de Komar bibe Komareke gelî û di hemû herêma bin desthilata wê de, gel şanaziyê pêve bike û heya îro jî gel Komar û biha û destkevtên wê mîrata xwe ya neteweyî bihesibînin.

Komara Kurdistanê tenê bi hilgirtina navê Komarê nebûye sembola neteweyî, belkî destkevt û remzên wê wiha kirin ku gel hertin şanaziyê pêve bike. Komara Kurdistanê ji bilî destkevtên girîng yên weke rêkxistina hêza neteweyî anku Hêza Pêşmerge, alaya Kurdistanê weke remza selimandin û yekîtiya neteweyî, di qada azadîxwaziya neteweyî de, yekemîn rêxistinekî siyasî û xwedî bername û pirogramekî modern e bo birêveberiya xebata gel di qada neteweyî û siyasî de û bi awayekî demokratîk, mafê çarenivîsa gel selimand û yekîtiya neteweî anî holê. Di qada perwerdehî û ronakbîriya Kurdî de jî, bi weşana rojname, kovar, bilavok, pertûk û lidarxistina xwendingehan bi zimanê neteweyî û şandina xwendekaran bo derverî Komara Kurdistanê, çirayeke din bo geşekirina civaka Kurdistanê hilkir.

Di qada xebata medenî de jî, rêxistinên sivîl ku heta wê demê kêmasiyên civaka Kurdistanê dihesibîn, li ser destê Pêşewayê zana hatin damezirandin. Bo mînak Yekîtiya Jinên Demokrat û Yekîtiya Ciwanên Demokrat ên Kurdistanê, bingehên xebata sivîl in di Kurdistanê de.

Di qadên ewlehî, ewlehiya neteweyî û aborî de jî, Komara Kurdistanê heya niha jî xwedî nav û deng e û di nava hikûmetên derdor û hevçaxê xwe de bê mînak e. bi wî awayî ye ku rêvîngên rêya Komara Kurdistanê heya niha jî hem şanaziyê pêve dikin û hem jî di pêxema bidestxistina armancên wê de di meydana xebatê de amade û cangorî ne.

Nerîna Lîderan

“Mike Pompeo”:
“Rejîma Îranê piştevanê yekem ê terorîzmê di cîhanê de ye”.

“Lloyd Austin”:

“Rejîma Îranê mezintirîn gef e li ser hevpeymanên Amerîka li Rojhilata Navîn”.

“Jean Yves Le Drain”:

“Îran di halê bihêzkirina çekên navikî de ye”.

“Îsa Kelanterî”:

“Di dema birêveçûna yasayên parastina hewaya paqij dê %70 a aboriya Îranê raweste”.

Rojava ji Îrana xwedî bombeya etomî ditirse

N: Eskender Ceiferî

Donald Trump serokkomarê berê yê Dewletên Yekbûyî yên Amerîkayê dewsa xwe de Joe Biden. Tê gotin dibe ku dewleta Biden vegere ser gotûbêjan ji bo rêkeftina etomî bi Îranê re.

Li nav Îranê dengên cuda hene. Lê belê dengê bihêz, ne yê rêformxwazan e lê dengê Sipaha Pasdaran e ku dibêje nabe rêkeftin bê kirin.

Di rastî de armanca rejîma Tehranê berhemanîna bombeya etomî ye. Ew dem bi kar tînin û bi meyandina Oranyoma zêdetirî 20 ji sedî, nêzîkî berhemanîna bombeyê dinbin.

Beriya niha di serdema Donal Trump de hem Benjamin Natanyahu serokwezîrê Îsraîlê û hem jî Trump ragihandibûn ku rejîma Komara Îslamî piştevaniya terorê dike û herî zêde xelkê Îranê ji vê mijarê zirarê dike. Teqez jî kirin ku divê rê li ber Îranê bê girtin. Eger ew rejîm bibe xwediya bombeya etomî, wê ji bo gtevahiya cîhanê bibe metirsiyeke mezin.

Li gor daxuyaniya wê demê ya Koşka Spî, Trump û Netanyahu di mijara dorpêçkirina Îranê ya di herêmê de nerîneke hevpar diyar kiribûn. Komara Îslamî jî bersiva berpirsên Îsraîlî û Amerîkî dabû û gotibû: Wê cîhan wan gunehbariyên ku rayedarên Îsraîl dike, ji bîr neke.

Piştî ku Donald Trump peymana etomî ya bi Îranê re bi tundî rexne kir, Rex Tillerson wezîrê Derve yê Amerîka jî xwest rêkeftina etomî ya bi Îranê re were guherandin û jinûve were nivîsandin lê ji bo razîkirina Îranê ew libenda piştgirîya hevalbendên xwe yên Ewrupî ne. Tillerson got jî ku xelên rêkeftinê têra xwe tund nîn in û rê li ber bernameya etomî ya Îranê nagirin ji ber vê jî ewê cara yekê bi Cevad Zerîf hevtayê xwe yê Îranî û wezîrên derve yên welatên ku peyman îmza kirine re, bicivin û mijarê gotûbêj bikin.

Wê demê Sergey Lavrov Wezîrê Derve yê Rûsyayê ku ji bo Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî li New Yorka Amerîkayê bû, li ser helwesta Amerîkayê ya di derbarê Îranê de dabû xuyakirin ku helwesta nelihevkirinê ya Donald Trump serokkomarê wê demê yê Amerîkayê ya derbarê Îranê de û rexnekirina bernameya etomî ya Îranê cihê fikarê ye.

Di hember de hertim Îran gefê li Amerîka û Îsraîlê dike û seyîd Ebdûlrehîm Musevî serfermandarê gîştî yê çekdarên Îranê ragihandibû ku ewê Telavîv û Hayfayê bi erdê re bikin yek.

Hesen Rûhanî serokomarê Îranê jî ragihand ku heke Amerîka ji rêkeftina etomî vekişe û jê poşman bibe, wê bedêleke giran bide û li gor nêrîna rejîma Tehranê, vekişîna Amerîkayê ji vê peymanê wê bibe sedema xercên mezin û ev ti fêdeyekê li amerîkiyan nake û wê zirareke mezin ji vî karî bibînin.

DYA bi raportên çalakiyên etomî yên Îranê re bi baldarî riftarê dike û gotara wezareta Derve ya Amerîkayê hemû wan pirsyaran bersiv nade ku çima Amerîka di îmzekirina raportan de dudil e û sedem çi ne lê bi gotara Hesen Rûhanî zelal dibe ku dorpêçên nû yên aborî, gefê li rêkeftinê dikin.

Rêkeftina etomî di roja 14ê Tîrmeha 2015an de bi tevlîbûna welatên ewropî hatibû îmzekirin û li gora wê, Îranê hin çalakiyên etomî kêm dikirin û di hember de jî dorpêçên aborî li ser Îranê dihatin kêmkirin. Lê Îsraîlê ji destpêkê ve ragihand ku ew, vê rêkeftinê naxwazin.

Beriya niha jî berpirsên saziya Nehêlana Çekên Etomî ragihandibûn her qasî ku Îranê bi hemû wan welatan re lihev kiriye, lê çavên Ewropiyan li Amerîkayê ne. Her biryarekê ku Waşington distîne, ji wan re dibe bandor. Berîtanya hewl dide DYA razî bike ku raportên li ser çalakiyên etomî yên Îranê demlidest îmze bike lê Trump li pey planeke din digere.

Piştî van hemû salan, rejîma Tehranê êdî qet rêkeftina etomî naxwaze ji ber ku êdî ew nêzîkî berhemanîna bombeyê bûne û ev rastî jî bi gotarên wan xuya dibe.

Beriya heyamekê çend welatiyên Amnayayê li Îranê hatin girtin. Partiya Kesk a Almanyayê dibêje rejîma Tehranê di hemberî azadkirina wan de dixwaze Almanyayê razî bike ku êdî dev ji rêkeftina etomî berdin.

Berî çend rojan Almanya, Berîtanya û Feransê di daxuyaniyeke hevpar de ragihandibûn ku nabe derfet bêne şewitandin. Ew dibêjin bi meyandina 20 ji sedî zêdetir a Oranyomê, êdî derfet ji bo rejîma Tehranê çê dibe ku zêdetirî berê bo ser cîhanê bibe gef.

Di beşeke din a daxuyaniyê de tekez hatiye kirin ku meyandina vê asta Oranyomê ne ji bo karûbarên pizişkiyê û ênêrjiyê ye lê belê li tevahiya cîhanê, ev asta Oranyomê tenê ji bo karûbarên çek û berhemanîna bombeyê têne bikaranîn. Ew dibêjin bi her awayekî be, divê pêşiya Tehranê bê girtin ji bo ku bombeyê berhemanîn.

Kurd û pêdiviyên yekrêziyê û xwendineke nû

N: Ebdulazîz Qasim

Li gor hindek şirovekarên siyasî ku Amerîka li serdemê serokatiya Joe Biden, dê rêbazek nû ya derve cuda ji siyaseta Trump pêrew bike, û li gor "Reuters" ku Anthony Blinken, berbijarê serok Joe Biden ji bo postê wezîrê derve, soz daye ku dîplomasiya Amerîkî "ya ziyangirtî" çalak bike, û siyasetek derve ji bo berjewendiyên gelê Amerîkî amade bike û eniyek yekgirtî ji bo rûbirûbûna "Rûsya, Çîn û Îranê" ava bike.

Her di derbarê vê yekê de, Prof. Xelîl Al-Ananî, mamosteyê têkiliyên siyasî li zanîngeha "Johns Hopkins" di gotarekî de dibêje ku "Joe Biden", di çar salên pêş de wê hewl bide ku xwe bi carekî ji mîratê serokê berê Trump xwe dûr bike, ku ti nemabû navûdengê Amerîka yê navxweyî û derveyî ji nav biçe. Al-Ananî dibêje ku "Joe Biden", di siyaseta derve de girêdayî lîberalîzmî ye, û "lîberalîzm" di warê têkilîyên navnetewî de doktrînek navdar e, ku ramanên wê li ser çar boçûnên bingehîn têne damezrandin: hevkarî li şûna nakokîyan, koka têkiliyên navnetewî ye, diyalog û danûstandin, li şûna hêz û çekan, avakirina têkiliyên baş di navbera welatan de bi rêya peyman û rêkkeftinan, girîngiyek mezin ya rêxistinên navnetewî heye yên ji bo parastina aştî û ewlehiya navnetewî dixebitin, ku dewletek bi tena xwe nikare serbikeve di rûbirûbûna pirsgirêkên cîhanê de).

Al-Ananî di gotara xwe de ya di bin navê "Biden û zehmetiyên vegerandina rêberayetiyek Amerîkî" dibêje ji bo vegerandina rola Amerîka ji bo rêberiya cîhanê, ku "Biden" bi kêmahî ve dê rastî çar pirsgirêkan bê ji wan (rûbirûbûna li gel Çîn, Rûsya, Îran û pirsgirêka serederiyê bi rejîmên otorîter re, nemaze li gel dewletên Erebî).
Li aliyekî din, şeş dewletên Erebî yên (Civata Hevkariya kendavê) piştî sê salan ji nakokiyan di navbera Qeter û Erbistana Siûdiyê de, karîn rûpelek nû vekin û gihiştin rêkkeftinekî, û helbet wê kartêkirinek mezin ya vê lihevhatinê hebe, nemaze ber bi têkiliyên bihêz li gel Îsraîlê ji bo kêmkirina bandora Tirkiye û Îranê li deverê, herwiha li ser qeyranên Yemen, Lîbya û Sûriyê jî.

Li gorî vê xwendinê tê pêşbînîkirin ku rola (Îran û Tirkiyê) û herwiha heta radeyekî rola Rûsyayê ji li Sûriyê lawaz bibe. Îran bi hêsanî ji Sûriyê dernekeve, û dê bêhtir rûbirû êrîşên Îsraîlê bibe, û ji bo derxistina Îranê ji Sûriyê, dûr nîne ku rêkkeftinek di navbera rêjîma Sûriyê û Îsraîlê de peyda bibe, ku hin çavkaniyên mediyayî dibêjin ku li serbazgeha Hemêmîm ya Rûsî li Laziqiyê civînek di navbera serbazên Sûrî û Îsraîlê de hatiye lidarxistin.

Tirkiya jî, piştî lihevhatina Erebî û têkçûna têkiliyên wê li gel gelek dewletên Ewropî, dîtir nikare berdewamiyê bide pirojeyê xwe yê destwerdana di Sûriyê bi taybetî piştî ku nikarî (Ayîn Îsa) dagîr bike, û herwiha bi dîtina min ku Tirkiya nikare hevsengiyê bêxe di navbera têkiliyên xwe yên bi Rûsya û Amerîka re, û siyaseta Erdogan wê bi carekî têk biçe.

Di vê navbirê de, pêdiviya kurdên rojavayê kurdistanê bi yekrêziyê heye û herwiha bi xwendinek nû û bi dîblomasiyeke nû heye, û nameya vê dawiyê ya balyozxana Amerîkî li Şamê bi zimanên Îngilêzî, Erebî û Kurdî careke din dupat dike ku Amerîka wê berdewam be li ser piştgiriya diyaloga kurdî-kurdî.

Renî li parêzgeha Urmiyê 5 ciwanên kurd kirine qurbanî

Reniya befrê li devera "Soma û Biradost" a girêdayê bajarê Urmiyê, canê 5 kolberên Kurd jê stand ku termê wan hêj di bin reniyê de maye û nehatine derxistin.

Roja Duşemî 18ê Kanûna Paşîn, 5 kolberên Kurd yên bi navên "Metîn Eslanî kurê Osman, Yawer Eslanî kurê Luqman, Bulen Ehmedî kurê Sadiq, Ûlayî Xudayî kurê Hetem û Firat Xudayî kurê Xûrşîd" xelkê gundê "Koran"ê li ser sînorê Urmiyê rastî reniya befrê hatin û canê xwe ji dest dane û pêka dawî zaniyariyan, termê wan kolberên Kurd di bin reniyê de mane.

Pêka gotina xelkê gundê "Koran"ê lêgeriyan li pey termê wan 5 ciwanên Kurd berdewam e û di şeva derbasbûyê de bona gihîştin bi cihê reniyê di navbera Rojhilat û Bakurê Kurtdistanê de hewleke micid hatiye dan.

Xelkê devera "Soma û Biradost" ku piranî hejar in, bi neçarî li nav meydanên mîn, têlên rêsayî, teqeya rasterast û dîwarên bêtonî de karên kolberiyê dikin.

Kolberên wê deverê bi piranî rastî teqeya resterast û teqîna mînan hatine û çendîn caran jî, rastî reniyan hatine ku bi wan sedeman bi 10an ciwanên wê deverê bona pariyek nanê helal, canê xwe ji dest dane û nexwestine nanê serşoriya rejîma Îranê bi zarokên xwe re bînin.

Kolberekî Kurd li ser sînorê bajarê Newsûdê hate birîndarkirin

Roja Çarşemî 24ê Befranbarê, kolberekî Kurd yê bi navê "Ariya Xalidî", xelkê gundê "Nerwê" yê ser bi bajarê Newsûdê, bi teqeya rasterast a hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê hate birîndarkirin.

Ew kolberê Kurd, bi bê agehdarkirina berê ji aliyê hêzên leşkerî ve teqe jê hate kirin.

Ew kolbere di encama wê bûyerê de, lingê wî birîndar bû.

Ew kolberê Kurd, bo tedaviya pizîşkî bo nexweşxaneya bajarê Kirmaşanê hate veguhastin.
Her di vê der heqê de roja Duşemî 22ê Befranbarê, kolberekî Kurd yê bi navê "Îrfan Ezîzyanî" kurê Mihemedsalih û xelkê bajarê Selas a Bavecanî, bi teqeya hêzên leşkerî yên hikûmeta Îranê li ser sînorê bajarê Newsûdê hate birîndarkirin.

Ew kolberê Kurd, bi bê agehdarkirina berê ji aliyê hêzên leşkerî ve teqe jê hate kirin û bo tedawiya pizîşkî bo nexweşxaneyê hate veguhastin.

Ew kolbere di encama wê bûyerê de, bask û milê wî ji aliyê hêzên leşkerî ve hate birîndarkirin.

Her di wê derheqê de, roja

Înê 19ê Befranbarê, kolberekî Kurd yê bi navê "Omîd Salihî" kurê Yedulah û xelkê gundê "Nigil" yê ser bi devera Kelaterzan a girêdayê bajarê Sineyê, bi sedema teqeya hêzên leşkerî yên hikûmetê li bilindahiya "Tete" hatibû birîndarkirin.

Jineke ciwan di bajarê Bokanê de dawî bi jiyana xwe anî

Roja Pêncşemî 25`ê Befranbarê, jineke ciwan bi navê "Mehtab Mewlanî" rûniştiya bajarê Bokanê bi sedema deskurtiyê dawî bi jiyana xwe anî.

Mehtab Mewlanî piştî canjidestdana mêrê xwe, bi sedema hejarî û destkurtiyê neçar ma ku dawiyê bi jiyana xwe bîne.

Ew jine xwediyê zarokek 8 sal e.

jiyannameya Ce`iferqulî Zengelî

N: Occo Mahabad

Pirr kes tunene ku wekî Ceferqulî hem wek derwêşekî oldar, gerok û muzîkjen hem jî wek fîlozof, zanyar, helbestvan û ronakbîrekî were dîtin. Li Xorasanê Ceferqulî wek efsaneyeke veşartî û razbar tê dîtin û vegotin. Hûn ji kî bipirsin derbarê Ceferqulî de gotineke wî heye.

Gundiyên Qûçanê ku girêdayî eyaleta Xorasana Rezewiyê dijîn wî sofiyekî muzîkjen û derwêşekî gerok wek Evliya Çelebî an jî Evdalê Zeynikê dibînin. Li gorî wan Ceferqulî çûye welatên curecur di wan welatan de pirr mirov nas kirine bi sedan helbest nivîsandine û dîsa gotiye welat, welatê min ê zêrîn vegeryaye axa Qûçanê.
Bajariyên xwende û zehftirîn girêdayî çîna burjuvayên biçûk in, Ceferqulî zana, fîlozof û edîbekî wek Ehmedê Xanî an jî Melayê Cîzirê dibînin. Bawer dikin ku Ceferqulî çiqas îlm û zanîn hebin di hişmendiya xwe ya edebî û hûnerî de veşartiye. Li gorî wan Ceferqulî li dijî şahê Fethelî Şahê Qacar şer daye lewma ji welatê xwe hatiye sirgunkirin hemû emrê xwe li dijî serdestiyê derbas kiriye.

Her çendî bawerî û gotinên xelkê Qûçanê bi vî awayî bin jî lê çend pirs û pirgirêk hene ku em zelal û safî bikin da ku Ceferquliyê rastîn derkeve holê û baştirîn bê fêm kirin.
Pirsgirêka yekemîn ew e ku em dizanin ku Ceferqulî ne xwende bû û tucarî helbestek bi destê xwe nenivîsandibû. Eşkere ye helbestên wî bi muzîkjeniya wî re belav bûne di nava gel de helbest xwendine xelk pirr jê hez kirine û ezber kirine.
Pirsgirêka duyemîn, di destê me de tu delîl tunene ku em bibêjin Ceferqulî li dijî serdestiya Fethelî Şahê Qacar têkoşîn daye û hatiye sirgunkirin.
Pirsgirêka sêyemîn jî ew e ku em bi başî nizanin ku helbestên wî yên hatine berhevkirin û çapkirin, kîjanî yên Ceferqulî ne yan ne yên wî ne. Divê li ser helbestên wî yên ku hatine berhevkirin û çapkirin lêkolîneke berfireh yên zimanî û wêjeyî bên kirin.

Ez ê nêrînên xelkê Qûçanê ku tên gotin deynim aliyekî ji we re qala Ceferqulî kî ye çawa jiyaye çi kirine li ku miriye bikim.

Ev şairê klasîk yê Xorasanê ku bi qasî Evdalê Zeynikê û Ehmedê Xanî girîng di heremê de bi hûner û wêjeya xwe deng vedaye, bi nasnavên Ceferqulî, Cefer, Ceferquliyê Kurd, Ceferê Bêbext, Bilbilê Xalxal, Ceferquliyê Bêçare, Ceferquliyê Endelîb, Ceferquliyê Muxtar, Ceferqulî Azad tê nasîn û binavkirin.
Ceferqulî Zengelî (Ceferquliyê Zengene, Ceferqulî Zengêlî, Ceferquliyê Zengine, Ce'fequliyê Zengelî) di sala 1799an de li gundê Gûganê yê bi ser bajarê Qûçanê ji malbateke feqîr û gundî tê dinyayê.

Qûçan girêdayî Eyaleta Xorasana Razewî ye. Serbajarê vê eyaletê Meşhed e. Îro nifûsa Qûçanê li dora 150î hezarî ye. Tê de Kurd, Faris û Tirkmen pev re dijîn. Qûçan 10 km. dûrî sînorê Tirkmenistanê ye.

Ceferqulî Zengelî ji êla Zengenê ye. Êla Zengenê êleke mezin e. Bêhtirîn li Kerkûk, Silêmanî, Xaneqîn, Kirmaşan, Hemedan, Lûristan û Gûranê bi cih bûne. Bi zaravayên Soranî, Kelhûrî û Lekî diaxivin.

Navê bavê Ceferqulî Mela Reza Qulî ye. Bavê wî ji ber nexweşiyê dimire û apê wî Hecî Elîesxer bi diya wî re dizewice. Ceferqulî ji aliyê apê xwe ve tê xweyîkirin û mezinkirin. Ew heta xortaniya xwe di gundê xwe de dimîne û mezin dibe.

Apê wî dixwaze Ceferqulî bixwîne, wî dişîne xwendingeha gund li cem Mele Berat lê Ceferqulî bala xwe nade dersên xwe naçe xwendingehê, heta ber êvarê li dora gundê xwe digere naxwaze bixwîne. Lewma Ceferqulî hînî xwendin û nivîsandinê nebûye.

Piştî 15 saliya xwe, bûye aşiqê qîzikeke bedew ya bi navê Melwarî ji sibê heta derengiya şevê bi eşq û evîna wê ya bêdawî ji vî gelî bigire ji geliyekî din wisa serberdayî rojên xwe bi xeyalên Melwariyê derbas dike. Bi xeyalên wê stranên evînî distrê û helbestên xamî di hişê xwe de digerîne.

Gundiyên herêmê Melwariyê qîzapa Ceferqulî û evîndareke rastîn dibînin lê bajariyên Qûçanê vê evînê wek evîneke mîstîk, xeyalî ya ku di hişê Ceferqulî de pêk hatiye teswîr dikin. Rastî her çi dibe bila bibe di encamê de muzîkjenî û helbestvaniya Ceferqulî bi eşqa Melwariyê dest pê kiriye.

Piştî xortaniya xwe Ceferqulî dixwaze Melwariyê ji bîr bike berê xwe dide welatên Qefqaziya, Osmanî, Hindistan, Ozbekistan, Turkmenistan, Efxanistan, Tacîkistan, Iraq, Erebistan, Sûriye, Misrê û Azerbaycanê lê nikare wê ji bîr bike dîsa vedigere Qûçanê. Di van geran de hînî zimanê Farsî, Erebî û Tirkî dibe. Ew xwe hînî amûra dûtaxê dike. Bi amûra dûtaxê helbestên xwe ji civatê re dixwîne. Xelkê herêmê bi vî awayî hînî helbestên wî dibin, bi demê re jê zehf hez dikin û lê xwedî derdikevin.

Stran û helbestên xwe ji bilî zimanê Kurdî, bi Erebî, Tirkî û Farisî jî vegotine. Em dibînin ku di qesîde û xezelên xwe de cîh daye beytên Erebî, Farsî û Tirkî. Ceferqulî hem helbestên olî hem jî yên ser eşq, evîn, bêrîkirin, êş û elemî nivîsandine. Gellek stranên ku îro li herêmê tên gotin bi meqam û helwên Ceferqulî hatine bestekirin.
Ev şairê klasîk yê Xorasanê mîna qalçîçekan hestyar, dilnazik, xwedî peyvên kûbar û nazenîn her çendî dîroka mirina wî tam neyê zanîn jî bi texmînî di sala 1894an de li Qûçanê, di cihê bav û kalên xwe de jiyana xwe ji dest dide.
Helbestên wî şairê girîng yê Xorasanî ji aliyê Kelîmulayê Tewehudî ve hatine berhevkirin û ji mirinê hatine rizgarkirin. Li Kurdistana Bakur dîwana wî bi navê "Le Xakê Xurasanê" ji aliyê weşanxaneya Avestayê hat çapkirin.
Ceferqulî bi romantîzmeke bilind, hestiyar û dilzîz hestên xwe bi awayekî vekirî, sade û watedar, bi helbestên canecan û dilgerm radixîne li ber hiş û rihê helbesthezan.

Helbesta wî ya Elo Xelkê vê rastiyê bi eşkere tîne ber çavan. Helbest bi êş, elem û hezkirineke mezin dest pê dike û wisa jî bi dawî dibe.

Elo xelko bibînin, bejnê yarê bû elem
Bi çavan û bijangan, min dikuje bi sitem
Herin hûn vegerînin, belkî li min bike rehm
Ez li arê işqê wê, dişewitim natê kerem.

Tê dîtin ku di gellek helbestên xwe de eşqa Melwariyê ku ew wek ar û alaveke sor şewitandiye, dîn û har kiriye tîne ziman. Bi taybetî di helbesta Qaliwek im de ev rewş bi awayekî rasterast tê dîtin û hîskirin.

Qaliwek im li herdu rûyê min li asimîn
Şev û ro dia dikim, melek dibêjin amîn
Diayên min qebûl bike, Xwedawendê alemîn
Ya Melwariyê bide min, ya canê min tu bistîne
Herdem li dev û dilê min amîn, ya Erhemê rahimîn.

Ceferqulî Zengelî li axa Xorasanê wek semboleke neteweyî pêşengiya wêje û helbesta klasîk ya Kurd dike. Ciyê şanaziyê ye ku xelkê Xorasanê jê zehf hez dike û di her warî de lê xwedî derdikeve ku neyê jibîrkirin.

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdistanê de

Pêla girtin û gazîkirina welatiyên Kurd yên Rojhilatê Kurdistanê li meha Befranbara îsal giheşte 36 kesan

Di rêkevta 17`ê heya 29`ê Befranbarê, mencek ji girtin û gazîkirina welatiyên Kurd di bajarên, Mihabad, Merîwan, Serdeşt, Sine, Bokan, Sewlava û Tehranê ji aliyê hêzên ewlehî yên rejîma Îranê ve, ku wisa pê diçe her berdewam be.

Rejîmê di bajarê Sineyê de wê midehê bi awayê sîstematîk dest avêtiye bi bin,avkirina çalakvanên medenî, û nerohniya çarenivîsa wan di gîrtîgehan de û lêpirsîn û îşkenceya wan ji aliyê navendên ewlehî ve bi merema wergirtina îtrafa bi zorê, dibe bi awayekî micid rejîma dagîrker ji aliyê navendên navnetewî yên mafê mirov ve bê şermezarkirin.

Li gorî amara ku Saziya mafê mirov a Kurdpayê belav kiriye, ji wan wan 36 welatiyên Kurd 32 kes ji wan hatine girtin û 6 kes ji wan bo îdareya Îtla`ata rejîmê hatine gazîkirin û lêpirsîn ji wan hatiye kirin.

**3 kes ji wan welatiyên Kurd (Ferzad Samanî, Sûheyb Badrûc û Behmen Yûsifzade) xwendekar bûne.
5 kes ji wan welatiyên Kurd (Dana Semedî, Karwan Mînûyî, Zinyar Mû`temêdî, Sîrwan Kerîmzade û Karo Elîdad) çalakvanên jîngehê bûne.**

10 kes ji wan welatiyên Kurd (Şepol Xizrî, Salar Rehewî, Derya Talibanî, Efşîn Mamehmedî, Sîrwan Nûrî, Ferhad Mûsapûr, Fireydûn Mûsapûr, Soran Mihemedî, Esrîn Mihemedî û Soran Husênzade) çalakvanên Medenî û Ferhengî bûne.

Piraniya wan çalakvanên medenî û welatiyên hatinî girtin derçûyê zanîngehê bûne.

**Navendên ewlehî yên rejîmê di dema binçavkirin û gazîkirina wan welatyên Kurd de bi wî awayî reftar digel wan kiriye.
Bi giştî 30 welatî bi bê belgeya yasayî hatine girtin.**

30 welatî piştî girtinê çarenivîsa wan nexuya ye û herwisa cihê mana 27 kesan nexuya ye ku tenê hejmarek welatî piştî çend rojan şiyane digel malbatên xwe pêwendiya telefonî hebin û malbatên xwe li binşavkirina xwe ji aliyê hêzên ewlehî ve di girtîgehên ewlehî yên Urmiye û Sineyê agehdar kirine.

Mala 18 ji wan kesên binçavkirî rastî êrîşa hêzên rejîmê hatine û vekolîne û herwisa kelûpelên 4 kesan ji aliyê hêzên ewlehî ve dest bi ser de hatiye girtin.

Herwisa Zanyar Mu`temêdî, xelkê Merîwanê di dema girtinê de ji aliyê hêzên ewlehî ve hatiye azar û îşkencedanê.

Nav û cihê girtin û gazîkirina wan 36 kesan bi wî awayî ye:

Xelkên bajarê Mihabadê: Derya Tallibanî, Şepol Xizrî, Salar Rehewî, Efşîn Mamehmedî, Sîrwan Nûrî, Îman Ebdî, Ferzad Samanî di Kerecê de hatiye girtin û Hesen Ebdî, Soran Mihemedî, Soran Husênzade, Emîr Bayezêdî, û herwisa Esrîn Mihemedî jî di Tehranê de hatiye girtin.

Merîwan: Dana Semedî, Zanyar Mu`temêdî, Karwan Mînûyî, Sîrwan Kerîmzade, Cebar Pîrûzî, Karo Elîldad bi awayê banghêşt, Sûheyb Badrûc di Kerecê de hate biçavkirin û Adil Perwaze.

**Sewllava: Selman Edwayî, Siyamek Edwayî, Ekrem Edwayî, Ferdîn Edwayî.
Rebet: Behmen Yûsifzade, Fireydûn Mûsapûr û Ferhad Mûsapûr.**

**Yên Bokanê: Ezîme Nasirî û Husên Gerdişî, Qadir Resûlpûr û Mihemed Hacî Resûlpûr.
Sine: Emîr Rizayî, Aram Muradiyan, Kamîl Nûrî û Aram Yûsifî bi awayê banghêşt bûye.**

Eva jî amarek bû ku saziya mafê mirov a Kurdpayê belav kiribû û serkut û tepeseriya rejîmê hember welatiyên Kurd dabû xuya.

Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (390)